# NA JI BO, INISIYATÎFÊN PÊKANÎNÊ´

## AUTOMATÎZMA DİJMİROVÎ Jİ BO MAYÎNA 2 MİLİYON KESÎ Lİ SWÎSRE DİBE TALÛKE

înîsiyatîva ji bo pêkanînê dibe talûke ji bo 2 milyon beyaniyên ku li Swîsre dijîn û kar dikin lê belê ne xwedî pasaporta Swisrî ne. Bi me-besta tewne kirink herî biçuk, wê bi rengekî automatik ji Swîsra were avêtin. Di vê rewşê de mirovên beyanî, neslê dûyemîn ji di bin talukê de ne. Ji bo rewşên wisa, qanûna pêkanînê ya li parlemenê hate pejirandin, kelemeke. Lewma înîsiyatifa Pêkanînê red bikin.

## SEXTEKARİYA ETÎKETKİRİNA Bİ RÊBAZÊN QURNAZ

înîsiyativa Pêkanînê alîkarî dide ji bo ku biryarên kevin, zu werin bi cih anîn. Lê belê ev bi temamî sextekari ye. Inîsiyativa Pêkanînê, qanûna berê ji bo avêtina ji Swîsre, gelekî li pey xwe dihêle û jê dijwartire. Inîsiyativ bi temamî qanûna berê ya ji bo terikandina Swîsre, bi rengekî gelekî tuj bi cih tîne.

## GUHNEDANEKE TALÛKE Jİ ALİYE WELATÊN SERWER VE

Inîsiyativa Pêkanînê mafên bingehîn ên destûra bingehin a Swîsre binpê dikin (qanûna Konvensiyona Mafê Mirovan û Peymana karkirin û mayîna li Swîsre). Inîsiyatîf xwe dixe şuna qanunçêkeran û mehkemeyan. Ew xwe dixe dewsa hemû nirxandin û pîvanan. Lewma prensîpa şîddetê du qat tê binpêkirin. Qebûlkirina înîsiyativê dibe sedema derketina pirsgirêkan di sîstemê de, di peywira qanûn, nîzam û sîstema me ya polîtîkî de.

## XİRAKİRINA TÊKİLİYÊN Ê RÊK Û PÊK Bİ YEKÎTİYA EWRÛPAYÊ RE

Li gorî parlamena Swîsre bi qebûlkirina Inîsiyativê re salê 10 hezar kes neçar dimînin bi awayekî automatîk bê ku rewşa wan were lêkolînkirin, ji Swîsre werin avêtin. Ev te wê maneyê ku Swîsre wê salê bi hezaran cara Peymana karkirin û mayîna li vî welatî, binpê bike. Qebûlkirina ve Inîsiyativê we bibe sedem ku di destura bingehîn a Swîsre de qanûneke din were bicih û teyîdkirin, ku ev ji wê bibe sedema xirakirina têkiliyên Swîsre li gel Yekîtiya Ewrûpayê re.



**«Pêkanîna însiyatîva dersînor dê wek sosret û Tsonamî be, dê gelek kesên ku hewcedarî ewlekariyê bin li ber pêlên xwe bibe. Ev tişt jî li welatekî wek Swîsrayê ku yasa desthilat e, qet nayê pejirandin.»**

Mano Khalil, sînemavanê Swîsrî.
Li Kurdistana Surî hatiyê dinyayê.
Li Bernê dijî.



**«Parlamena Swîsre Inisiyativa ji bo avêtina derve welet, bi cih anî, li hem-beri ve yekê SVP bêdeng ma. Pozisiy-ona wan a niha ya gelekî dijware, ji bo bicihanîna înîsiyativê li dijî sistema me ya demokratîke.»**

Cesla Amarelle, Perlementera federal,
Profesorê hikûkê li Zaningeh
à Neuchâtel, li Yverdon dijî.



**«Ev înîsiyativ tesîr li kesên ku li vir hatine dinyayê jî dike, tevî ku ew xwediye pasaporta Swîsre ne. Ji ber ku ew jî wê bi hemana sucên biçuk, bê ku pirs û îfade ji Swîsre werin avêtin!»**

Ihsan Kurt, Jîhgirê Serokê SP, Serokê
Komisyona integrasyonu û koçberîyê,
Sosyolog, li Lozanê dijî.

## WELATİYÊN SWÎSRE YÊN DİÇİN DERVEYİ WELAT DİKARİN BİKEVİN Bİ TESİRE

Di salên dawî de, bi qasî miliyonek mirov bune himwelatiye Swîsrî. Li derdora 880 hezar welatiyên Swisre li welateki din bune xwediyê nasnamak din. Eger kesên wisa tevlî dengdanê bibin, hingê ev inîsiyativ wê neyê qebulkirin. Na ji bo înîsiyativa Pêkanîne ya dijmirovî, mumkune, bi tenê dema ku em dengê xwe bikarbinin


## EM DİBEJİN NA Jİ BO ÎNÎSİYATİVA PÊKANÎNÊ

Partî u saziyên almanî, fransî, îtalî, albanî, elewî, erebî, kurdî, portogîzi, slowenî, kroatî, sirbî, spanî, tamilî u tirkî biryar girtine, bi hev re li dijî vê înîsiyativa dijmirovî û taluke têbikoşin.
Ev belavok bi 11 zimanan heye. Yên bixwazin dikarin ji Partiya Sosîalist a Swîsr bipirsin.


## EM ALÎKARIYÊ JI WE DIXWAZIN

Partiya Sosîalîst koçberan ji bo wekheviya hemu koçberên di qadên siyasî, aborî, civakî û çandî de. Em mafê wekhevî û tevlîbuna jiyana siyasî ya hemê koçberan dixwazin. Em li dijî hemu binpêkirina mafane û em bi partî, sazî u kesên koçber re gelekî nêz dixebitin. Hûn jî alikariya pera bidin Partiya Sosîalîst koçberan. Têkilî:
www.spschweiz.ch/migranten (deutsch)
www.pssuisse.ch/migrants (en français)


# EZ ÇAWA DENG BIDIM?



Nameyê vekin





Rûpela dengdayînê dabigirin




Rûpela dengdayînê têxe zerfê û bigre




Nasnameya deng-dayînê imze bikin



Zerfa dengdayînê û nasnameya deng-dayînê têxin zerfa mezin ya ji bo şandinê



Li dawiyê zerfê herî dereng heta 20 Sibatê bi reya postê ji şaredariyê re bişînin yan jî heta herî dereng 24 Sibatê têxin qutiya postê ya şaredariyê

Têkelî: SP MigrantInnen, Postfach 7876, 3001 Bern, Telefon 031 329 69 69, info@spschweiz.ch, www.spschweiz.ch/migranten
PS Migrant-e-s, case postale 7876, 3001 Berne; teléfono: 031 329 69 69; info@pssuisse.ch; www.pssuisse.ch/migrants
Ji kerema xwe re alîkariya pere bişînin:
– SP Schweiz, 3001 Bern, PC 30-28039-3, IBAN CH45 0900 0000 3002 8039 3, ji bo «SP MigrantInnen, Kampagne Durchsetzungsinitiative»
– PS Suisse, 3001 Berne, PC 30-28039-3, IBAN CH45 0900 0000 3002 8039 3, ji bo «PS Migrant-e-s, campagne mise en œuvre»